Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 398 nameronahi@gmail.com 20- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Koçberên Şengalê di bin şertên zehmet de dijîn



***Bi hatina havînê re welatiyên ji Şengalê yên li kampên Çem Mişko û Qadiyan yên girêdayî Zaxo û Kampa Şariya ya Duhokê yên li başûrê Kurdistanê dimînin şertên jiyana wan zehmet buye û bi nexweşiyan re rû bi rû ne. Welatiyên li kampan diyar kirin ku ew dixwazin vegerin Şengalê lê destura wan nayê dayîn.***

Welatiyên ku di fermana Şengalê ya 2014'an de neçar mabûn koçber bibin û li kampên Başûr bi cîh bibin, bi destpêkirina germa havînê re rewşa wan zehmettir buye. Ji ber bê avî û elektrîkê, nexweşî belav dibin. Bi hatina havînê re şêniyên kampên Çem Mişko û Qadiyan yên girêdayî Zaxo û Kampa Şariya ya Duhokê, vê carê bi germê û nexweşiyan re rû bi rû mane. Li gorî welatiyan li kampan pirsgirêka ava vexwarinê û kehrebeyê gelekî zêde ye û ji ber wê jî nexweşî çêdibin. Bi taybetî tunebûna avê û ceyranê jiyana şêniyên kamê vegerandiye dojehê û hedara wan nîn e.

Hin şêniyên kampan jî gotin ku ew dixwazin vegerin Şengalê lê destura wan nayê dayîn.

**KAMPA ÇEM MIŞKO**

Li gorî agahiyên şêniyê kampa Çem Mişko yê bi navê A.R., gelek malbat dixwazin vegerin Şengalê, lê rêveberiya kampê destura wan nade.

A.R. destnîşan kir ku ew di şertên nebaş de dijîn, lewma dixwazin vegerin Şengalê, lê ew bi girtinê tên tehdîtkirin û wiha got: "Gelek kes mîna min dixwazin vegerin Şengalê, lê destur nayê dayîn. Em bi xizmên xwe yên di kampên din re jî dikevin têkiliyê, lê ew jî mîna me di rewşek pir zehmet re derbas dibin. Tu alîkarî ji wan re nayê kirin, kehrebe û av li ser wan hatiye qutkirin. Ger fermanek din çêbibe, ew ê jî bi destê PDK`ê çêbibe. Gelek gefan li me dikin. Hebûna me ya li Herema Kurdistanê metirsiyek pir mezine li ser jiyana me. Ji bona wê jî ez dengê xwe digihînim her dera cîhanê bila me ji vir derxînin."

**KAMPA QADIYA**

Ji kampa Qadiya jî welatiyekî ku nexwest navê xwe bide, ev agahî dan: "Ev 8 rojin ava vexwarinê li ser kampê hatiye qutkirin. Di kampê de 12 hezar kes dijîn. Di rojên destpêkê de gelek kesan serî li îdareya kampê da û xwestin sedema pirsgirêkê fêr bibin. Rêveberê kampê got ku şebekeya avê xirab bûye. Gelê kampê rojana bi tenkeran ji gundê Qadiya yê ku kamp lê hatiye avakirin, avê jixwe re tîne. Lê gelek malbat hene îmkanên wan nîn in. Bi dehan zarok ji ber germa havînê û bêaviyê nexweş ketine."

Şêniyê kampê got ku ger ev rewş dewam bike ew ê xwepêşandan lidar bixin û xwest ku rê ji wan re bê dayîn ku karibin vegerin Şengalê.

**KAMPA ŞARIYA**

Li Kampa Şariya ya girêdayî Duhokê jî kesekî ku nexwest navê xwe bide, diyar kir ku rojê 15 saetan kehrebeya wan qut dibe û got: "Ji ber wê jî em ji germê nikarin di çadiran de bijîn. Rayedarên kampê dixwazin li hindirê kampê kehrebê bi firoşin me û jeneretoran bînin.

Welatiyê bi navê F.A jî ragihand ku ji ber pirsgirêka kehrebeyê zarokên wan nexweş dikevin. F.A. bang li saziyên eleqedar kir ku alîkariya wan bikin.

Di komkujiya ku çeteyên DAIŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de li Şengalê pêk anîbû de, bi deh hezaran kes jî neçar mabûn koçber bibin. Piştî rizgarkirina herêmê, gel jî dest bi vegera ser warê xwe kir. Heta niha bi hezaran kes vegeriyan malên xwe, lê gelek jî hîn li koçberiyê ne...*ROJNEWS*

## Li bin germê û sermayê "Konên Koçeran"



Koçer konên taybet bi xwe re digerînin û bi rêya van konan xwe ji germa havînê û sermaya zivistanê diparêzin. Ev kon li gorî payeya civakî ya xwediyê xwe, ji gelek beşan pêk tê.

Ji ber taybetmendiya jiyana koçeran rêbazeke koçberiyê di jiyana xwe de didin meşandin û mala xwe "kon" ku ji mûyê bizinan hatiye çêkirin bi xwe re digerînin.

**TAYBETIYÊN KONÊN KOÇERAN**

Yek ji taybetmendiyên konê koçeran ew e ku tewandina wê baş tê kirin da ku bi hêsanî ji deverekê ber bi devereke din ve bê veguhestin. Her wiha li gorî rewşên hawayî yên havîn û zivistanê guncaw e.

Konê koçeran bi hêsanî û bi buhayekî erzan tê çêkirin. Piraniya koçeran konên xwe, ji mûyê bizinan çêdikin.

Di serdemên kevn de koçeran kon ji hiriya hêştiran û mûyê bizinan çêdikirin. Lê di serdemên niha de ta û derzî dikirin û pê çêdikin.

**CUREYÊN KONAN**

Konên koçeran ên niha jî du cure ne. Konê demsala havînê ji çewalan tê çêkirin û di havînê de hênik dibe. Cureya din jî ji mûyê bizinan tê çêkirin ku di demsala zivistanê de tên vegirtin ji ber ku nahêle ava baranê tê re derbas bibe.

Kon dabeşî du beşan dibe, beşek taybet bi mêran e û jê re Dîwan tê gotin û her tim ji bo pêşwazîkirina mêvanan vekirî ye, beşa duyemîn jî taybet bi jinan e û tê de jin karên xwe yên amadekirina xwarinê dikin û di navbera her du beşan de perdeyeke nexşkirî heye.

Koçeran her wiha koneke taybet ji şêxê qebîle yan serokê eşîrê re çêdiki. Li Bakurê Sûriyeyê û bi taybet li gundewarên navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî ber bi bajarên Reqa û Dêrazorê ve hejmareke mezin a koçberan hene. Ajansa me ANHA'yê serdaneke koneke koçeran a li gundewarê Eyn Îsa kir û jiyana koçeran di van konan de şopand.

Hemîd El-Ferhan yek ji koçberan e û behsa rêbazên jiyana xwe ya koçberiyê û çêkirina konên koçeran kir û wiha got: "Em fêrî jiyana koçberiyê bûne, li gorî çêra sewalên xwe em her tim koçber dibin."

El-Ferhan di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku ji serdemên kevnar ve bav û kalên wan di konên koçeran de jiyane.

Koçerekî din ê bi navê Ferhan El-Ubêd destnîşan kir ku konên wan ên demsala havînê û yên demsala zivistanê ji hev cuda ne...

*ANHA*

## Konferansa Travmaya Derûnî ya Rojava û Başûr tê lidarxistin




Li parêzgeha Silêmaniyê ya Herêma Kurdistanê wê Yekemîn Konferansa Travmaya Derûnî ya Rojava û Başûrê Kurdistanê bê lidarxistin.


Rêxistina Bijîşkên Derunînasiyê ya Bêsînor û Navenda Kotîm ku rêxistinên Holandî ne, bi hevkariya Rêxistina Geşedanên Sivîl (CDO) wê Yekemîn Konferansa Travmaya Derunî ya Rojava û Başûrê Kurdistanê li dar bixin.

Konferans wê di 19 û 20'ê Hezîranê de li navenda CDO ya li Silêmaniyê bê lidarxistin. Serokê Rêxistina Bijîşkên Derunînasiyê ya Bêsînor Bijîşkê Şêwirmendiya Travmaya Derunî Dr. Aram Hesen, Cîgira wî Xeya Bin Akir, Prof. Dr. Mîranda Olf ji bo amadekarî û tevlîbûna konferansê hatin Silêmaniyê.

Ji Rojava û Başûrê Kurdistanê jî wê gelek bijîşkên deruniyê tevlî konferansê bibin.

Di konferansê de wê li ser mijarên wekî, "Astengiyên li pêşiya çareserkirina pirsgirikên deruniyê. Girîngiya peydakirina dermanê ji bo nexweşiya travmayê. Bandora travmayê ya li ser kesayeta zarok û malbatên wan." Bên gotubêjkirin. Her wiha wê li ser rewşa welatiyên ku ketine destê çeteyên DAIŞ'ê û bi taybetî jî rewşa jinên Êzidî bê gotubêjkirin.

## Rûmate gel hêjayî her tiştî ye



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû destnîşan kir ku divê hêzên demokrasiyê û gelê Kurd li pêşberî êrîşan paş ve gavê neavêjin û got: "Girîng e hîn bi rêxistinî û zanebûn li dijî êrîşan li ber xwe bidin. Hay ji komplo û provokasyonan hebin, lê belê serî li ber zext û zilmê netewînin û îradeyeke hê bi biryar nîşan bidin. Ji rûmet û îradeya azad a gelekî hêjatir tiştek nîne. Bi deh hezaran ewladên gelê Kurd li şûna jiyaneke bê rûmet, berxwedaneke bi rûmet hilbijartine." *R-4*


## Wezîfeyeke mezin dikeve ser milê jinan



Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Elîf Ronahî diyar kir ku di 24'ê Hezîranê de ji bo ku faşîzm bê têkbirin divê her kes bi berpirsyariya xwe ya dîrokî rabe. Elîf Ronahî bal kişand li ser rola jinan jî wiha got, "erk û wezîfeyeke mezin dikeve ser milê jinên Kurd û Tirkiyeyî. Pêwîste jin zanibin ku her dengekî wan guleke demokrasî û azadiyê ye." *R-3*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 398 20- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Bila herin Kurdistana xwe



Qasim ENGÎN *R-4*

# BILA KURD LI DIJÎ DAGIRKERIYÊ RABIN



## ENIYA NETEWÎ LI ÇÛ QENDÎLÊ

Gelê kurd li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk yên li ser hemû parçeyên Kurdistanê ketiye nava seferberiyê. Bi sedan kesên ji hemû bajarên başûrê Kurdistanê ku di nava wan de rêveber, endamên partiyên siyasî û bawermend hene eniyeke netewî ava kirin û çûn çiyayê Qendîlê. Eniya Netewî li Qendîlê peyamên têkoşînê da û bang li her kesî kir ku li dijî dagirkeriya Tirk rabin. *R-5*

## PIŞTGIRIYÊ BIDIN TÊKOŞÎNA GELÊ KURD

Ciwanên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê yên di nava wan de komek ciwanên enternasyonalîst ên Fransî jî heyî, serdana çalakgerên mertalên zindî yên li Qendîlê kirin. Ciwanan daxuyanî dan û diyar kirin ku ew ê rê nedin dagirkeriya dewleta Tirk a li ser başûrê Kurdistanê. Ciwanan wiha got, "Divê hemû kesên xwedî wijdan li dijî dagirkeriyê derkevin. Li kûderê dibe bila bibe, divê piştgiriyê bidin têkoşîna rizgariya gelê Kurd." *R-2*

## Em ji bo azadiya jinan şer dikin



Şervanên YPJ'ê yên di Pêngava Bagera Cizîrê de cih girtine, diyar kirin ku wan azadiya xwe di nava YPJ'ê de dîtin û destnîşan kirin ku ew ê ji bo azadiya hemû jinan, têbikoşin. Şervanan got, "Ji bo hemû jin bighêjin maf û azadiya xwe emê têkoşîna xwe bidomînin." *R-3*

## 24'ê Hezîranê em ê govendê bigerînin



HDP'ê li Stenbolê di çarçoveya xebatên hilbijartinê yên 24'ê Hezîranê de mîtîngeke bi heybet lidarxist. Bi sed hezaran beşdarî mîtîngê bûn. Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan di mîtîngê de axivî û got, "Me bi ciwantî dest pê kir em ê bi cîwantî bi ser bikevin. Di 24'ê Hezîranê de em ê bi hev re govendê bigerinîn." *R-4*

## Ji bo aştiyê 700 kîlometreyan meşiyan



Li Efganîstanê şerê di navber rêxistina Talîban û dewleta Efgan de didome. Li Efganistanê bi dehan kes ji bo ku şer raweste û aşitî pêk were bi qasî 700 kîlometreyan meşiyan û gihiştin Kabîlê paytexta Efganistanê. Çalakvanan peyam dan leşker û Talîbanan û gotin, "bila êdî şer bi dawî bibe. Beriya her tiştî bila aşitiyeke mayînde pêk were. " *R-2*

## Em dest bidin hev em ê xurt bin



Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş ji girtîgeha Edîrmeyê ku lê dîl girtî ye, mesajeke nû şand. Demîrtaş wiha got, "Sîstema yek şexsî rê li ber parçebûneke mezin vekir. Bi demokrasiyeke xurt em dikarin xwe li hev bigirin. Em dest bidin hev, ji ber ku guhertin bi te dibe." *R-4*

## Em ê li başûr rê nedin artêşa Tirk



Endamê Konseya Fermandariyê yê HPG'ê Amed Malazgîrt diyar kir ku Artêşa Tirk amadekariya operasyonekê dike û got, "Em jî amadekariyên xwe dikin. Dewleta Tirk dixwaze şer li Başûrê Kurdistanê bidomîne. Berdêla wê çi dibe bila bibe, em ê nehêlin artêşa Tirk li Başûrê Kurdistanê bi pêş ve biçe." *R-5*

## Êrîş nîşaneya têk çûnê ne



Hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Rîham Hico diyar kir her dem dewleta tirk de êrîş li ser deskeftiyên gelan û bi taybetî jî gelê kurd pêk anîye û xwestiye wan ji çanda wan dûr bixe. Rîham got, "Êrîşên dawî yên li ser başûrê Kurdistanê û gefên li ser Şengalê jî nîşaneya têkçûna dewleta Tirk e." *R-5*

## NY hişyar kir: Biryara darvekirinê rawestînin



Rêjîma Îranê guh nade hişyariyên raya giştî ya nevnetewî û dixwaze ciwanê Kurd Ramîn Huseyîn Penahî darve bike. Raportorên Taybet ên Înfaza Bêdaraz a Neteweyên Yekbûyî, têkildarî biryara Rejîma Îranê ya derbarê Ramîn Huseyîn Panahî de Îran hişyar kir û xwest bi lezgîn biryarê rawestînin. *R-2*

## Di êrîşekê de 52 leşkerên rejîmê hatin kuştin



Li herêma El Harî ya başûrê rojhilatê Bûkemalê yê girêdayî Dêra Zorê li dijî hêzên rejîma Sûriyê êrîşeke hewayî hate kirin û hate gotin ku herî kêm 52 çekdarên alîgirê rêjîmê mirine. Ajansa Nûçeyan a Fermî ya Sûriyê SANA îdîa kir ku êrîş ji aliyê hêzên koalîsyonê de hatiye kirin. Koalîsyona navneteweyî ev îdia red kir. *R-2*

# Ciwan li dijî dagirkeriyê li Qendîlê ne

***Ciwanên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê yên di nava wan de komek ciwanên enternasyonalîst ên Fransî jî heyî, serdana çalakgerên mertalên zindî yên li Qendîlê kirin. Ciwanan daxuyanî dan û diyar kirin ku ew ê rê nedin dagirkeriya dewleta Tirk a li ser başûrê Kurdistanê.***



Ciwanên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê yên di nava wan de komek ciwanên enternasyonalîst ên Fransî jî heyî, serdana çalakgerên mertalên zindî yên li Qendîlê kirin. Çalakgeran diyar kirin ku wê berxwedana Başûrê Kurdistanê û Qendîlê bikevin dîrokê.

Çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê di roja 10'emîn de didome. Ji herçar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê ciwan û gel diçin serdana çalakgerên mertalên zindî û serdanên wan didomin.

Piştî gelê Ranya, Qeladizê, welatiyên Rojava, siyasetmedar, pêşmergeyên Dêrîn, hunermedan û Meclîsa Bakur, ciwanên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê yên di nava wan de komek ciwanên Fransî yên enternasyonalîst jî heyî serdana çalakgerên mertalên zindî yên li Qendîlê kirin.

Ciwanan daxuyanî dan û diyar kirin ku ji bo rê nedin dagirkeriyê li Qendîlê ne.

Li ser navê Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê Sîpan Raperîn axivî û diyar kir ku êrîşên dagirkeriyê yên li ser Başûrê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê berdewam dikin û dixwazin her çar parçeyên Kurdistanê dagir bikin, ji ber wê li Qendîlê ne. Raperîn wiha got; "Weke ciwanên Başûrê Kurdistanê, heya gefa dagirkeriyê li ser Qendîlê hebe, em jî wê li Qendîlê bîn. Em ê xaka xwe ji dagirkeran re bernedîn. Îro li vir wê gel û gerîla bi hev re berxwedanê bigihîn serketinê."

Koma ciwanên enternasyonalîst ên Fransî yên ji bo piştgiriya çalakgerên mertalên zindî çûne Qendîlê jî daxuyanî dan. Elîsa Îcha û Matthîs diyar kirin ku li ser navê komên enternasyonalîst ên li welatê wan hatine Başûrê Kurdistanê û Qendîlê û wiha gotin; "Ji bo şermezarkirina rejîma Erdogan a faşîst û li dijî şer derketinê em hatin Qendîlê. Divê hemû kesên xwedî wijdan li dijî şer derkevin. Li kûderê dibe bila bibe, divê piştgiriyê bidin têkoşîna rizgariya gelê Kurd."

Jinên ciwan ên ji Rojhilatê Kurdistanê û Qendîlê jî daxuyanî dan û banga xwedî derketina li berxwedana Qendîlê kirin."

## Ji bo aştiyê 700 kîlometreyan meşiyan



Li Efganistanê bi dehan kes ji bo aştiyê di bin germa zêde de meşiyan. Çalakvan bi qasî 700 kîlometreyan meşiyan û gihiştin Kabîlê paytexta Efganistanê.

Çalakvanek ji AFP'ê re axivî û got, "Dema ku ez diçim mala xwe yan jî dikanê, dibe ku ez werim kuştin. Min biryar da ku mirina ji bo aştiyê ew ê baştir be."

Di destpêkê de heşt kes bûn. Di meşê de hejmara wan bû 70 kes. Meşvanên aştiyê di dawiya hefteyê de gihiştin Kabîlê. Di nav wan de kesên seqet ên wekî Zahir Sûltanî jî hebû. Sultanî got, "Ji ber teqandina mayînan, çavên min kor bûn."

Sûltanî dema di otobusa Kandahar-Heratê de bû, mayîn teqiyaye. Sûltanî dibêje, "Ez dizanim ez herim Hindistanê ez ê karibim tedawî bibim. Lê beriya her tiştî ez dixwazim aştî were."

Mûhammed Sarwarî yên ku bi daran dimeşe jî dibêje ku, "Heke hemû Efgan bi carekê re aştiyê bixwazin û bibêje 'bila şer bi dawî bibe', ez bawer im ew ê aştiyeke mayînde pêk were."

Meş li Leşkergehê dest pê kir a ku navenda rêveberiyê ya eyaleta Helmandê ye. Çalakvan di bin germa 40 derece de meşiyan. Hemû jî bi rojî bûn. Di dovîzan de, "Em westiyan, em aştiyê dixwazin" hatibû nivîsandin.

Li gundan wekî 'qehreman'an hatin pêşwazîkirin. Peyamên aştiyê dan leşker, polîs û endamên Talîbanê. Serwarî yê ji ber felca zarokan nikare bimeşe dibêje ku 'Tu cihekî ewle tune'.

Talîbanê ji ber Cejna Remezanê agirbesta sê rojan îlan kiribû. Beriya wê jî hikumetê agirbesta yekalî îlan kiribû. Çalakvanê bi navê Bîsmîllah Watandost dibêje ku, "Em dixwazin hikumeta û Talîban agirbestê îlan bikin. Agirbesta ji bo sê rojan têr nake. Em dixwazin muzakereyên aştiyê dest pê bike û qala aştiyê bikin. Divê ji bo jiyana bi hev re, çareseriyekê bibînin."

## NY hişyar kir: Biryara darvekirinê rawestînin



Raportorên Taybet ên Înfaza Bêdaraz a Neteweyên Yekbûyî, têkildarî biryara Rejîma Îranê ya derbarê siyasetmedarê kurd Ramîn Huseyîn Panahî de Îran hişyar kir û xwest bi lezgîn biryarê rawestînin. Raportorên Taybet ên Neteweyên Yekbûyî Agnes Callamard, Raportorê Taybet ê Mafê Tenduristiyê Dainius Puras, Raroptorê Taybet ê li dijî Îşkenceyê Nils Melzer, têkildarî biryara Rejîma Îranê ya der barê siyasetmedarê kurd Ramîn Huseyîn Panahî de Îran hişyar kir û xwest bi lezgîn biryarê rawestînin.

Raportorên Taybet ên NY'ê ji Îranê xwest ku siyasetmedarê kurd Ramin Hossein Panahi bi lezgîn biryara darvekirinê rawestînin û biryarê betal bikin.

Raportoran diyar kirin ku Panahî bi awayekî adîl nehatiye darizandin û mafê wî yê tenduristî û tibbî hatiye asteng kirin. Raportoran da zanîn ku dîsa li girtîgehê rastî îşkenceyê hatiye. Raportoran da zanin ku sucdariya der barê Panahî ne li gorî standartên navneteweyî ne û gotin: "Ji ber ku Îran guh nade hişyariyan ku biryara darvekirine betal bike û dixwaze biryarê pêk bîne der barê biryara têkildarî Panahi de em bi fikar û xemgîn in."

Endamê KOMALA Penahi, di çileya 2018'an de ji aliyê Dadgeha Şoreşê ya Îranê ve rastî cezayê darvekirinê hatiye.

## Ciwanên Azad li dijî Tirkiyê çalakî li dar xistin



Ciwanên Azad li bajarê Gavle yê Swêdê, ji bo boykotkirina Tirkiyê kon vedan û dest bi çalakiyê kirin.

Ciwanên Kurd konê xwe yê çalakiyê li meydana Storatorgetê vedan û wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û alên PKK'ê pê ve kirin. Ciwanan li ser tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, dagirkirina Efrînê û êrîşên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê belavok belav kirin.

Ciwanên Azad dewleta Tirk ji ber dagirkirina Efrînê protesto kirin û bang li Swêdiyan û hemû koçberan kirin ku Tirkiyê boykot bikin û malên Tirk nekirin.

Ciwanên Azad xwestin, tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê rakirin û were berdan.

## HPG: Divê gelê me bi nûçeyên derew yên AKP'ê nexape



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li Colemêrgê û êrîşên hewayî yên li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:

"Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Agirî û Şehîd Pîroz de hêzên me li Colemêrgê li dijî artêşa TC a dagirker çalakî kirin. 16'ê Hezîranê saet 23:30'î hêzên me li dagirkerên liser girê Xeregolê yê li navçeya Çelê xistin. Derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin.

17'ê Hezîranê saet 18:00, hêzên me yên YJA Starê li girekî dijmin xistin ku ewlekariya qereqola Bezelê ya navçeya Şemzînanê dikir. Ji sê baskan ve gule li çeper û stargehên dijmin hatin reşandin.

Balafirên şer ên artêşa TC a dagirker roja 16'ê Hezîranê saet 23'an derdora gundê Çemço yê herêma Zapê ya Herêmên Parastinê yên Medyayê, 17'ê Hezîranê piştî nîvro jî qada Adilbeg a herêma Avaşînê bombe kirin.

Di van êrîşên berfireh de yên li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê, hêzên me yên gerîla ti windahî nedane. Dewleta TC a dagirker timî Qendîlê di rojevê de dihêle û bi rêya medya alîgirê xwe di çarçoveya propaganda şerê taybet de îdîa dike ku gerîla windahî dane. Nûçeyên bi vî rengî ne rast in. dike. Bila gelê me bi nûçeyên derewîn ên desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê nexape."

## Di êrîşekê de 52 alîgirên rejîmê hatin kuştin



Li gorî bîlançoya dawî, li herêma Dêra Zorê ya li rojhilatê Sûriyê di êrîşa hewayî de herî kêm 52 çekdarên alîgirê rejîmê mirine ku piraniya wan biyanî ne.

Êrîş şeva Yekşem-Duşemê li herêma El Harî ya li nêzî sînorê Iraqê li dijî şervanên alîgirê rejîma Sûriyeyê hate kirin. Bîlançoya êrîşê giran dibe.

Li gorî Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê herî kêm 52 kes mirine ku 30 jê Iraqî, 16 jî Sûriyeyî ne. Hate gotin, di nava van de leşker û milîsên Sûriyeyî jî hene.

Beriya niha hatibû ragihandin ku 38 kes mirine. Saziya Çavdêriyê diyar kir ku wan tespît nekirine bê êrîş ji aliyê kîjan hêzê ve hatiye kirin û ragihand, birîndar rakirin nexweşxaneyên li Bûkemalê û Iraqê.

Rayedarekî leşkerî yê li Dêra Zorê ji AFP'ê re got, balafirên şer êrîş birine ser çeperên hevpar ên Iraq-Sûriyeyê yên li El Harî.

Televîzyona dewletê ya Sûriyeyê ji êrîşê koalîsyona navneteweyî berpirsyar dît. Rayedarekî koalîsyonê jî diyar kir ku ne balafirên Amerîkî ne jî yên koalîsyon êrîş nekirine. Heman çavkanî da xuyakirin ku haya wan jê çêbûne ku di êrîşê de ya dijî hêza milîs a Şîa ya Iraqê ku Îran destekê dide wan, gelek şervanên Katibe Hîzbûllah mirine. Ajansa Nûçeyan a Fermî ya Sûriyê SANA îdîa kir ku êrîş ji aliyê hêzên koalîsyonê yên bi pêşengiya DYA de hatiye kirin.

### KOALÎSYONÊ ÎDIA RED KIR

Koalîsyona navneteweyî ku DYA pêşengiyê jê re dike, îdîaya li ser êrîşa li herêma Dêra Zorê ya li dijî hêzên rejîma Sûriyê red kir. Rayedarekî koalîsyonê ji AFP'ê re axivî û diyar kir ku li herêma hatiye gotin, êrîşeke hêzên Amerîkî ya jî koalîsyonê nebûye.



# Daxistan navê hunera hemdem bû

***Daxistan li çiyayan bi qasî xebatên pratîkî yên gerîla di nav xebatên çand û hunerê de jî nûjenî û dîsiplînê esas digire. Daxistan li hemberî ferasetên ku dixwestin xebatên çand û hunerê ji rê derxin û dejenere bikin bi sekna xwe ya rêxistinî û bi xebatên xwe yên pratîk bersiv dida.***



Şemseddîn Ariturk ji çiyayan ji atmosfera ku çiya bi mirovan re hestên azadî û baweriyê diafirînin hez kiribû lewma dema tev li nav refên azadiyê bû navê xwe kiribû Daxistan.Şemseddîn Ariturk ango Daxistan Koçer ji çiyayan û koçeriyê dihat. Di nav refên gerîla de navê xwe kiribû Daxistan ku Daxistan dihat wateya 'çiyayî'. Koçerî jî ji cewhera dilsoziya wî ya ji welatparêziye dihat. Dema ji dayik bûbû navê wî kiribûn Şemseddîn Ariturk. Ne ji Şemseddîn û ne jî ji paşnavê Ariturk hez kiribû. Ji gava ku xwe nas kiribû koçerekî esîl bû û temenê xwe li çiyayan derbas kiribû. Beriya tev li nav gerîlayan bibe li meskenên dapîr û babîrên xwe jiyana li çiyayan û di nav koçeriyê de mezin bibû.

Her çiqasî hêzên dagirker ji bo koçeriyê biqedînin çûna çiyayan qedexe kiribin jî wî bi îlhama ku wergirtibû dê paşnavê xwe kiriba Koçer. Wî ji çiyayan ji atmosfera ku çiya bi mirovan re hestên azadî û baweriyê diafirînin hez kiribû. Lewma dema tev li nav refên azadiyê bû navê xwe kiribû Daxistan. Hestên azadiyê yên ku çiya di mirovên kurd de diafirînin bi jiyana xwe fêr bibû. Ji ber vê yekê bi Daxistan re taybetmendiyên çiyayan kedkarî, hêz û çalakvanî bûbû yek. Ji ber vê li çiyayan tişta ku herî zêde bala wî dikişand kedkarî bû. Daxistan ji qadên ku herî zêde kedkarî lê hebû tev li nav refên azadiyê bûbû. Dema tev li nav refên gerîla bû di du tiştan de zehmetî nekişand. Yek ji van, çiya yek jî keda ku mirov dike mirov bû.

### DAXISTAN NE XERÎBÊ ÇIYAYAN BÛ

Ne xerîbê çiyayan bû. Bi salan li çiyayan jiyabû. Malbata wî ji bo debara xwe sewalvanî dikir. Ji ber vê rastiyê bi salan li çiyayan koçerî kiribû. Çiya ji bo mirovên kurd her dem cihê xwespartinê û her wiha cihê ku hebûna xwe lê diparastin. Daxistan bi salan li çiyayan, xwe ji pêkutiyên dewleta faşîst a tirk û ji polîtîkayên wê yên leşkerî, siyasî, aborî û çandî kêm be jî parastibû. Ji ber wê beyî ku nirxên kurdîtiyê wenda bike di nav refên azadiyê de jî wê berdevam kiriba û kesayeta xwe li gorî vê ava kiriba.

### WEKÎ NAVÊ XWE DIJIYA

Pêkanînên faşîzane yên dewleta tirk xwe gihandibû sivîlên li çiyayan û ji rehên jiyanê hatibûn qutkirin û her wiha koçerî hatibû bidawîkirin. Beriya wê bi salan li çiyayên Kurdistanê agirêkî evînê hatibû pêxistin. Wî jî dil dabû evîna li çiyayan. Bûbû lêgervanekî wê. Li çiyayan şervanên azadiyê nas kiribû. Ji wê demê û şûn ve êdî ev jî milîtanek bû ku li her qadê bi keda xwe tev li jiyanê dibû. Di pêvajoyeke wiha de dikeve destê dewleta faşîst a tirk Daxistan.

Daxistan çi di pêvajoya lêpirsînê de, çi jî di pêvajoya zindanê de rûyê qirêj ê dewleta faşîst dibîne. Vê rastiyê kîn û hêrsa wî li hemberî dewletê zêde kiribû û dilsoziya wî ya bi têkoşînê re bi pêş xistibû. Daxistan rastiyekê hîs dike. Ev jî rastiya ku li hemberî dijmin pêwîst e serketî be û rêya vê jî xwe di xeta Rêberê Gelê Kurd Abdullah û tevgerê de kûrkirine. Ji ber vê girîngiyê xwe dide perwerdeyê û lêkolînan dike. Her giha pêvajoya zindanê ji bo xwe weke şansekî dibîne ku dikare xwe di perwerde û xeta Ocalan de hîn zêdetir kûr bike.

### HUNERA XWE LI ÇIYAYAN PÊŞ XIST

Dema pêvajoya zindanê qediya êdî ne tenê welatparêzekî ku alîkarî û piştevaniyê dike, bûye milîtanek ku di armanc û hedefa xwe de zelal bûye, bi vê armancê xwe perwerde kiriye û xwedî biryar û îradeyeke bêhempa ye. Êdî baş fêm kiriye ku yekane rêya mirov ji qirêjiyên dewletê wergire di çiya û gerîlayan re derbas dibe. Bi vê armancê berê xwe dide çiyayan. Dema digihîje çiya û gerîlayan xeribiyê nakişîne. Ji gava yekemîn a diavêje nav gerîla heta nefesa xwe ya dawî di her şert û mercî de dibe xwedî sekneke kedkar, durist û bi îstiqrar.

### TEV LI XEBATÊN TEV-ÇAND'Ê DIBE

Daxistan li çiyayan di nav xebatên TEV-ÇAND'ê de cih digire. Bi qasî xebatên pratîkî yên gerîla di nav xebatên çand û hunerê de jî nûjenî û dîsiplînê esas digire. Daxistan li hemberî ferasetên ku dixwestin xebatên çand û hunerê ji rê derxin û dejenere bikin bi sekna xwe ya rêxistinî û bi xebatên xwe yên pratîk bersiv dida. Daxistan di xebatên xwe de her tim bi nûjeniyê dixwest bibe bersiv û ji aliyê din ve jî texrîbatên ku hêzên serwer li ser gelê kurd çêdikir dikir mijar. Daxistan, bi qasî xebatên komî, di xebatên tekekesî de jî dema derdiket ser dikê temaşeker di nav lîstika xwe de diherikand. Dizanibû peyama xwe bi awayekî herî bi bandor bide. Tu carî hevalên xwe yên gerîlla yên di nav xebatên çand û hunerê de kar kiribûn ji bîr nedikir. Li ser dikê bi lîstikên xwe ew zindî dikir. Daxistan, xebatên çanda şoreşgerî yên ji Xelîl, Hêvî, Yekta berdewam dikirin bi sekn, ked û tevlêbûna xwe veguherandibû xetekê û bi jiyana xwe temsîla wê dikir.

### XEBATÊN HUNERA ŞOREŞGERÎ MEŞAND

Şemseddîn Ariturk bi nasnav Daxistan Koçer, xebatên şoreşgerî yên çand û huner ên li welat ji bo li derveyî welat jî veguheze gelê kurd di sala 2010'an de derket rêwîtiya Serhedê. Bi qasî zehmetiyên rê bi awayekî aktîf di nav xebatên gerîla de cih girt. Daxistan ji ber bêderfetiyan û hinekî jî ji bêşansiyan ku negihiştin cihê ku divê bigihêjinê dema di rêya vegerê de bûn li gundekî ku diçûnê di encama hevkariya xiyanet û komploya bi hêzên paşverû yên Îranê re di encama kemînekê de bi hevalê li gel xwe Lokman re di 18'ê hezîrana 2011'an de beşdarî karwanên şehîdan dibe. Daxistan Koçer herî zêde jî bi texlîda Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê yê wê demê Osman Baydemîr di bîra gelê kurd de maye. Bes li çiyayên Kurdistanê tu zinar namîne ku li wê derê bi rêya lîstik, şano û skeçên xwe hunera kurdî bi pêş nexistibe…*Jêder/e-rojname*

## Çalakiyî û projeyên Navend Mihemed Şêxo



**Melek DEMÎRTAŞ**

Di çarçoveta çalakî, xebat û projeyên Navenda Çand û hunera Mihemed şêxo ya Bajarê Qamişlo ku di dema dawî de hatine kirin çine, rojnemeya Ronaha serdana Nevendê kir û Endamê Koma Sazkar Bêkes Darî ev agahî dan û diyar kir ku navend gele çalakî hatin kirin û wiha got: "Di Gûlanê de piranî xebat ser avakirina komîna şano, wekî endam, cih û alavên pêwîst jêre hate rawestandin. Dê ku di destpêka meha Hezîranê de di hundirê navenda Mihemed Şêxo de bi merasîmekê bê vekirin. Her wiha ev komîn tenê beşê şano bigire wekî saziyek cûda bi navê şano bê kirin."

### ERKAMEYA EM Lİ HUNERMENDÊN XWE DERKEVİN

Bêkes diyar kir ku wekî navnda Çand û Huner, Desteya Çandê û Yekîtiya Hunermendên Cizîrê bi merasîma definkirina hunermed Selah Osê rabûn û wiha pêd çû: "Cîgirê Yekîtiya Hunermendên Cizîrê, hunermed Selah Osê ku di 7'ê Gulanê de çû ser dilovaniya xwe merasîmek oxir kirinê rabûn. Ji ber ku ev wekî erkekî dikeve ser milê me ku em xwedî li unermendên xwe derkevin. "

### DU STARNÊN NÛ AMED DİKİN

Her wiha Hunergeha Ş.Welat amedkariyên tomarkirina du stranên nû dike yek bi zimanê kurdî û yadin Bi Erebî. Strana bi navê (Ev Welat) wê Yakîtiya Hunermendan pê rabin, wê 20 hunermend dê stranê bêjin. Di hemna demê de jî koma Botan û Sazkar jî amedkariyên staran bi zimanê Erebî ya bi navê (Awazê Şahîd) dikin."

### RÊZE FİLM TÊ ÇÊKİRİN

Di çarçoveya çalakiyan de Bêks anî ziman ku koma şano amedekariya rêze film komîdî dikin û wiha dom kir: "Ev nêzî mehek ku amedkariya rêze filîmê komîdî tê kirin, ku her xelek ser mijarekê cûdaye girêdayî civakê ye. Her wiha ev rêze fîlim piranî ser renxnekirina sazî û dezgehên xizmetî û civakî dike, heya niha tenê xelek hatiye amede kirin ew jî bi navê Koncal e. Ku ser vê filmê erînî bikin, dê di demên pêş de 30 xelek bêne çêkirin."


### GOVENDA NETEWA DÎMOKRATÎK

Bêkes bi bîrxist ku di meha adarê projeyek goven û filklorî hebû û wih adom kir: "Projeyek li darxistina govendek bi 100 endamê ser asta Herêma Cizîrê bi navê Netewa Demolrtaîk dê di meha adarê bi hata li darxistin , lê ji ber rewşa Efrînê ku hate dagirkirin, ev prohe hate pêşxistin. Ku di dema niha de dîsa ser vê proje awaz û perwerde tême kirin."Bi rast hatina cejna Remezanê jî wekî Navenda çand û hunera Mihemed Şêxo bi alîkariya koma Girbawî di roja duyemîn a cejnê de li navçeya gurbawî şahî ji bo zarokan li darxistin. Em wekî Tevgeraa Çand û Hunera Demokratîk tevlîhemû çalakî û merasîman dibin."

### MİHRÎCANA ZAROKAN Lİ DARKEVE

Hêjayî bi bîrxistinê ku dê di Meha Tîrmehê de Mihrîcana Zarokan li Herêma Cizîrê bê lidarxistin, ji bo wê jî 30 şagirt di heftiyê de du caran perwerdeyên alavên mûzk û mota li navenda Mihemed Şêxo dibînin."

## Du Ol, yek bawerî



**Sîpan ŞÎNDA**

Erdnîgariya Kurdistanê, ji aliyê bîr û baweriyan ve pirr dewlemende. Gelik ol, netew, mezhep, baweriyên cihê di tê de jiyane û dijîn. Herweha erdnîgariyeka birîndare ji. Bi deha caran birînên xedar li vê erdnîgariya wêran hatine vekirin. Ji ber wê, erdnîgariyek wêrane. Coxrafyayek dilşikestiye. Raste hovan gelik dilşikestin êxistine di nava civakê de û gelik qir kirin çêkirîne. Lê ev rastiya vê erdnîgariyê naguhere. Emê îro qala du olan û baweriyek, çandek hevbeş bikin. Di Çiyayê Cûdî de du gund hene. Hesana û Akêt. Hesana dikeve başûrê Cûdî, (alê deştê) û Akêt ji dikeve bakûrê Cûdî. Ev gund her yekê dikevin di nava geliyek kûr de. Du gundên gelik xweş û têr av û dehl bûne. Akêt gundê Misilmana ye. Hesana ji gundê Fileha ye (Xiristiyan). Her dû gund ji di salên 1990 î de ji aliyê dewletê ve hatine xira kirin. Hesanî hemî çûne Ewrûpa. Bes Akêdî li Cizîr, Sirnex, Silopiya mane. Mesela me li ser van her dû gundan ji aliyê bawerî û têkiliyê ve ye. Li Hesana Asûrî, Keldanî di jiyan. Mezhebên wan ji Katolîk-Nastûrî, Protestan bûn. Di Hesana de her mezhebekê Dêra wan hebû. Ji van Dêra yek jê navê wê dibêjin Dêra Marmîşil. Ango Dêra Mûsa Pêximber. Ev dêr ya mezhebê Nastûrî (Katolîk) bû. Dibêjin ev dêrek gelkî kevne. Li gor gundiyan dibe ku dîroka wê ji 2000 salî pitir be. Li gor baweriyê dibêjin ev dêr mişayêxe. Li gor baweriya bawermendên gund, dema yek nexweş biketa, seqet bibûya, falincû yan ji dîn bibûya dibirin li ser vê dêrê. Hege ew kesên nexweş di dêrê de razayan û ew mişayêx bihata xewna wan, ewan kesan ji wê şîfa bidîtiya. Xwediyên nexweş ji di vê navberê de sewalek şerjê dikir û dikirin xêr didan gundiyan. Akêt ji gundek yê Misilmanên Sinî ye. Li Akêt ji mizgevtek heye û dibêjin di nava vê mizgevtê de mişayêxek heye. Ev mizgevt ji gelkî kevne. Dibêjin ev mişayêx di dema Îslam nû li herêmê belav bûyî şehît ketiye. Paşê ji li wir ev mizgevt çêkirine. Herweha li gor baweriya wan ji dema yek nexweşiyên weke falincê, seqetiyê, teb, hal, yan ji dînîtiyê bigihaya wan, bihatan li ser vî mişayêxî wê baş bibîna. Bes diviya nexweş di nava mizgevtê de razaya û ew mişayêx bihata xewna nexweşî/ê û tiştek bidaya nexweşî/ê. Herweha dîsa xwediyên nexweş sewalek şerjê dikirin û dikirin xêr û didan gundiyan. Dîsa jinên zarokên wan ji neçêbiyan dibirin li ser vî mişayêxî da kû Xwidê zarokekê bide wan. Akêdiya ewqas baweriya xwe li vî mişayêxî anîne, dibêjin dema gund ava, hingî sal rojekê serê malê pezek ji bo xêra wî şerjê dikirin. Heta dibêjin heyamekê dema pez şerjê dikirin diviya xwîna wî pezî bavêta taqê mizgevtê. Ev du gundên cida li herêma Botan ji aliyê baweriyê ve me nirxandin. Tişta balkêş, her yekê ji olekê bawer dikin, lê dibêjin misilmanan ji nexweşên xwe dibirin li ser dêrê û filehan ji yên xwe dibirin li ser mizgevtê. Dema mirov berê xwe dide baweriyên wan ango rîtûelên wan yên olî çiqas dişibin hevdû! Ya rast ji aliyê têkiliyên civakî û çandî ve ji her wisa bûye. Têkiliyên Hesaniyan û yên gundên din ji yên Filehan bi gundên Misilmanan re gelik xweş bûne û her tim ser hevde çûne û hatine, dostînî bi hev re danîne. Heya niha ji ev dostanî bi riya teknolojiyê didome.

# Rêyên Qamişlo tên sererastkirin

**Welatiyên bajarê Qamişlo ji ber xerabûna rêyan bi gazinc in. Xerabûna rêyan tesîrê li ser trafîkê jî dike. Şaredariya Qamişlo dest bi sererastkirina rêyên ketin û derketina bajêr kir. hevseroka Komîteya Rêveberiya Şaredariyan a Kantona Qamişlo Bihar Bekir got, “ xweser hewl dide bi derfetên heyî pirsgirêkan çareser bike.”**



Rêveberiya Şaredariyan a Kantona Qamişlo wê di hefteya pêşiya me de 8 hezar û 400 metre rêyên têketin û derketina Qamişloyê çêke. Ji sedî 90 rêyên nava bajar xirabe ne.
Yek ji pirsgirêkên herî mezin ên bajarê Qamişlo pirsgirêka rêyan e. Li gorî daneyên şaredariyê ji sedan 90’ê rêyên bajêr xira bûne. Ji rêyên têketin û derketina bajar bigire heta rêyên nava bajar xirabe ne. Ev yek jî zirareke mezin dide gel û erebeyên wan.
Derbarê mijarê de hevseroka Komîteya Rêveberiya Şaredariyan a Kantona Qamişlo Bihar Bekir diyar kir ku çêkirina rêyên bajar erkeke wan a sereke ye û wiha got: “Di dema rejîmê de tu girîngî nedihat dayîn, rêyên bajar giştî xirab bûn. Piştî ku Rêveberiya Xweser hat ser kar, xwest bi derfetên xwe pirsgirêkên heyî çareser bike.”
Bihar Bekir destnîşan kir ku ew dê destpêkê rêyên girîng çêkin û wiha axivî: “Rast e, ji sedî 90’ê rêyên Qamişlo xirab in, lê em ê ji karê herî girîng dest pê bikin. Niha rêyên ku herî zêde bandorê li gel dikin, rêyên têketin û derketina bajêr in. Em ê vê havînê her du rêyan çêkin.”
Bihar Bekir li ser detayên projeya çêkirina rêyên têketin û derketina bajêr diyar kir ku bi giştî 8 hezar 400 metre rê dê bên çêkirin. Ji van 4 hezar û 200 li Rêya Rojhilatê Qamişlo (rêya Amûdê) û 4 hezar û 200 metre li Rêya Rojavayê Qamişlo (rêya Tirbespiyê) wê bên çêkirin. Ji bo projeyan nêzî 200 milyon pereyê Sûriyê hatiye veqetandin. Wê civîna herî dawî de ji bo destpêkirina kar di 20’ê Hezîranê de pêk bê. Ji bo baş pêkanîna kar komîteyek ji endezyar, endezyarên fenî û kesên pispor hatiye amedekirin û di hefteya pêşiya me de dê dest bi kar bike.”
Bihar Bekir ji bo pirsgirêka rêyên nava bajêr wiha axivî: “Em nikarin hemû projeyan bi hev re çêkin. Wek her kes dizane şerek li herêmê heye û ev bandorê li kar û xebatên me dike. Ji bo van projeyan pereyek zêde dixwaze. Em ê destpêkê rêyên têketin û derketinê çêkin, ji bo yên di nava bajêr de jî di demên pêş de li gorî derfetan çêkin.”…*ANHA*

## Kooperatîf lingê sereke yê aboriya civakê ye




Li navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo, lingê sereke ya aboriya civakê kooperatîf e. Kooperatîf di gel ku têkiliyên civakê xurt dike, jêdera sereke ya gelek malbatan e. Rola jinan di avakirin û pêşxistina koperatîfan de sereke ye.
Li navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo, ji destpêka ku sîstema komînal hatiye rûniştandin ve şêniyên navçeyê aboriya xwe ya civakî bi koperatîfan pêşdixin.
Li navçeyên Tirbespiyê û Til Hemîsê bi beşdarbûna 600 endamî 19 koperatîfên çandiniyê bi 17 hezar domin erd hatin avakirin.
Piştî ku ev koperatîf bi ser ketin, şêniyên gundan jî ev terûbe pêk anîn. Di vê çarçoveyê de, du koperatîfên sewaldariyê hatin vekirin. Yek li gundê Mizgeftê û ya din li gundê Girê Mergê.
Di koperatîfa li gundê Mizgeftê de 82 kes û ya gundê Girê Mergê jî 11 kes cih digirin. Li aliyekî din jî bi beşdarbûna 14 endam û 3 karkeran dikana firotina mirîşkan bi rengê koperatîf hate avakirin.
Derbarê koperatîfan de, berpirsyarê koperatîfên navçeya Tirbespiyê Mihemed Emîn Remedan El-Mihemed diyar kir ku armanca wan a sereke ji koperatîfan, belavkirina çanda bi hev re jiyankirinê û rê girtina li ber keysbaziyê ye.
Mihemed Emîn, destnîşan kir ku di du salên derbasbûyî de berhemên koperatîfan pir baş bû û anî ziman ku îsal barana kêm bandoreke neyinî li ser berhemdayîna koperatîfên çandiniyê kir.
Derbarê mekanîzmeya alîkardayîna ji bo koperatîfan Mihemed Emîn got,” Mala Kooperatîfan a navçeya Tirbespiyê destekê dide her kooperatîfan, bêyî ku destwerdana di biryarên wan de bike, ji ber ku bi kooperatîfan civakeke azad ava dibe.”

**DI KOOPERATÎFAN DE ROLA JIN**

Di avakirin û pêşxistina koperatîfan de rola jinan sereke ye. Di vê çarçovê de kooperatîfên taybet ên jinan hatin avakirin.
Jinan, kooperatîfa Înanna ya çêkirina mûnê, 3 koperatîfên çandiniyê li xeta Alya û Sinceq ava kirin. Di her sê koperatîfan de 6 hezar domin erd hate çandin û 40 jin tê de cih girtin.
Rêvebera Aboriya Jin a navçeya Tirbespiyê Behîra Îbrahîm da zanîn ku jin roleke sereke di pêşxistina aboriya xweser de dilîze û got, “koperatîf jêdera aboriya jinê ye.”
Behîra Îbrahîm, têkildarî plansaziya koperatîfên jinan, diyar kir ku di demên pêş de wê li gundê Hilwa firneyek bi beşdarbûna 11 jinan were vekirin, her wiha kargeha madeyên paqijiyê û dikaneke cilan li gundê Maşûq, û dikana firotina zebzeyan li Til Marûf bêne vekirin…*ANHA*

## 127 hezar geştiyar serdana herêmê kirin

Îsal wek her carê ji ber cejna remezanê 127 hezar geştiyar ji navend û Başûrê Iraqê, her wiha ji Rojhilatê Kurdistanê serdana Başûrê Kurdistanê kirin.
Başûrê Kurdistanê ku li gorî Iraqê herêmeke hênike, daristan, çiya û avên xwe zehfin di cejna Remezanê de dîsa geştiyarên Iraqê berê xwe dan Başûr. Di 3 rojên cejnê de 27 hezar geştiryar serdana herêmê kirin.
Berdevkê Geşt û Gûzarê ya Herêma Kurdistanê Nadir Rûstî diyar kir ku di 3 rojên cejna Remezanê de 27 geştriyar serdana Hêrama Kurdistanê kirine.
Berpirsê Giştî yê Geşt û Gûzarê (tûrîzm) ya parêzgeha Silêmaniyê Elî Rewif Xefûr jî diyar kir ku ji van 127 hezar geştiyaran 50 hezar geştiyar serdana parêzgeha Silêmaniyê kirine û ji bo pêşwazîkirina geştiyaran jî komîsyoneke taybet avakiribûn.
Elî Rewif Xefûr got tevî ku hikûmeta Îranê baceke zêde ji geştiyaran distîne jî lê, dîsa jî geştiyarên Rojhilatê Kurdistanê berê xwe dane herêmên geştiyariyê yên Başûrê Kurdistanê…*ROJNEWS*



## Buroya Karkirinê derfetên kar ava dike




Bi armanca kêmkirina rêjeya bêkariyê di nava welatiyên Reqayê de û bi taybet di nava ciwanan de Buroya Karkirinê ya girêdayî Komîteya Karûbarên Civakî bi hemû derfetên xwe hewl dide kar ji welatiyên Reqayê re peyda bike.
Buroya Karkirinê ya girêdayî Komîteya Karûbarên Civakî ya Meclisa Sivîl a Demokratîk a Reqayê bi armanca peydakirina kar ji welatiyên Reqayê re û bi taybet ji ciwanan re li gorî bawername û pisporiyên wan bi hemû hêz û derfetên xwe dixebite û pêşwaziya daxwaznameyên welatiyan dike.
Heta niha hejmara daxwaznameyên ji Buroya Karkirinê re hatine 6 hezar in.
Buroya Karkirinê li gorî bawername û pisporiyên welatiyan li gorî derfetên xwe mehane ji 350 heta 400 welatiyan di saziyên cuda de bi cih dike.
Girêdayî mijarê endama Rêveberiya Buroya Karkirinê Hêlîn Îsmaîl wiha got: “Em rojane pêşwaziya nêzî 100 welatiyan dikin û em hewl didin ji van welatiyan re karekî peyda bikin. Di vê çarçoveyê de pêşbirk tên lidarxistin da ku welatî li gorî bawername û pisporiyên xwe di saziyan de bêne bicihkirin.”…*ANHA*



## Siyaseta bi makyaj

Medeni FERHO



Kurd xwedî enerjiyek atomîk in û li hemberî atoma mekanîk têkoşînê dikin û serketî ne. Di şerê sêyemîn yê cîhanê de, Kurd bûne hêza guhertinê, xeta sêyemîn ya alternatîf biserxistin. Lê dagirkirina Efrînê û hilbijartina 24ê Hezîranê dane xuya kirin ku, ji bo serketinê tenê şerkirin ne bes e. Hêzên xwediyê atoma mekanîk, bi komploya navneteweyî mêjiyê Kurdan berdest kirin, piştre îzole kirin. Ez behsa Birêz Ocalan dikim. Êdî “sahîh” e ku, kolonîkirina Kurdistanê ji tevahiya koloniyên cîhanê cûdatir e û navneteweyî ye.Hemberî ku enerjiya atomîk ya Kurdan, terora global têk bir jî, hêzên global siyaseta komplo terk nekirin. Tenê li Rojava “siyaseta bi mekyaj” kirine pratîkê. Di şerê yekemîn yê cîhanê de, Kurdistana parçekirî radestî hêzên dewşirme kirin. Dewşirme, ji aqîl’iyetê dûr in û biqasî bombeya atomê dijwar in. Dewletên li ser xaka Kurdistanê hatin ava kirin, sed sal in, Kurdan qirdikin û di rekiha hesinî de dîlgirtine. Mafê jiyanê biqasî “koletiya wan” dane, sed sal e, qet, şer ji Kurdistanê ranekirin.Di sed salî de, yekemîn car, di pêvejoya çareseriya pirsgirêka Kurd de, (2013) hêviyek derkete holê. Lê hêzên global destur nedan. Bawer nakim ku Erdogan bi aqilê xwe yê epîlepsîk, “red-î Mutabaqata Dolmabahaçe” kiribe. Hêzên ku, peyama Ocalan ya Newroza Amedê bi çepikan pêşwazî kirin, ji bo reda mutabaqatê dengê xwe nekirin. Dibêjim, Birêz Ocalan, bi pêvejoya çareseriyê, li hemberî komploya navneteweyî serketinek dîrokî bidestxist. Lê qebûl nekirin. Îro jî, em li Rojava dibînin ku hêzên global “siyasetek bi makyaj” dimeşînin, îmajek bi maqyaj şanî me didin. Na xwe, çima tecrîdek hewqasî dijwar? Gelo tecrîd tenê bi têkoşîna Bakur ve girêdayî ye? Dubare dikim: Hêzên global, li hemberî dehşetengîz şerê li dijî Kurdan siyasetek diru, bi makyaj dimeşînin. Siyaseta bi makyaj û îmaja bi maqyaj, rezalet e û ne tenê faşîzma Erdogan, faşîzma komên çete jî afirandin. Komên faşîst jî, terora global afirandin. Terora global, bi saya têkoşîna enerjiya atomîk ya Kurdan têk çû. Vê têkoşîna destanî, Kurd û hêzên global nêzîkî hev kirin. Hişmendiya hêzên global ya li dijî Kurdan hinekî şikest. Lê bi giştî ji holê ranebû. Dagirkirina Efrînê, rûyê hêzên global eşkere kir û da xuyakirin ku terora global, cilên faşîzma Tirkî li xwe kirine... Kurdan bi awayekî şermok, dijberiya xwe nîşan dan. Kesî dengê wan nekir. Erdogan jî, cîhanê bi vê terorê tehdîd dike. Faşîzma Turkî, “ekstra erd” bidestxistin!.. Xewn û xeyalên Musil û Kerkûkê jî, bi macereyeke nû kire pratîkê; erê Qendîlê û Şingalê tîne ziman, lê ev her du nav, tevahiya Başûr in. Hêzên global, ji ronahiya gelan, ji şiyarbûna gelan, ji entelektueliya gelan, bi taybetî ji hêza atomîk ya gelan ditirsin: Ji xeta alternatîf ya sêyemîn ditirsin; ji fikr û felsefeya Birêz Ocalan ditirsin; ji Şoreşa Rojava ditirsin.Ji bo ku ev tirs, werê berteref kirin; dive demildest yekîtiya Kurdan werê ava kirin, divê HDP, di hilbijartinên 24ê Hezîranê de serketinek ciddî bidest bixe; li Rojava û li Başûr, hevkariya gelan, baweriyên cûda werê bi hêz kirin. Ev her sê merc, wê hêza atomîk ya Kurdan serbixe û êrîşên dagirkerî û tunekirina Kurdan berteref bike. Hêzên global ji dîrokê, ji xiyaneta li hemberî dîrokê û gelan şerm nakin. Mînaka Korê, ji bo Kurdan balkêş e: Hêzên global, Korê jî kirin du parçe, lê bi hawara Bakurê Korê Çîn beziya û li Kunurî hêzên global perîşan kirin. Divê Kurd, ji referanduma Başûr, ji wêrankirina 8 bajarên Kurdan, ji dagirkirina Efrînê dersan bigirin. Pêşengên neyartiya Kurdan dewşirmeyên Tirk dikin!..Li her devera Kurdistanê, mirina bi destên dijmin heye. Sê merc giring in.



# Wezîfeyeke mezin dikeve ser milê jinan

**Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Elîf Ronahî diyar kir ku di 24’ê Hezîranê de ji bo ku faşîzm bê têkbirin divê her kes bi berpirsyariya xwe ya dîrokî rabe. Elîf Ronahî bal kişand li ser rola jinan jî wiha got, “erk û wezîfeyeke mezin dikeve ser milê jinên Kurd û Tirkiyeyî. Pêwîste jin zanibin ku her dengekî wan guleke demokrasî û azadiyê ye.”**



Elîf Ronahî bal kişand ser girîngiya hilbijartinên 24’ê Hezîranê û got, “ji bo faşîzm bê têkbirin divê her kes bi berpirsyariya xwe ya dîrokî rabe.”
Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Elîf Ronahî, hilbijartinên 24’ê Hezîranê yên li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê nirxand.
Ronahî destnîşan kir ku ev hilbijartin gelekî girîng in ku dikare bandorê li paşeroja gelên Kurdistan û Tirkiyê bike. Elîf Ronahî got, “divê hemû dengdêr bi vê bîr û baweriyê dengê xwe bidin. Pêwîste, Kurdên Elewî bi rengekî çalak tevlî hilbijartinê bibe. Elbîstan, Pazarcix, Mereş û gundên wê bi salan deng dan CHP’ê. Rewşa CHP’ê ya niha û nêzîkatiya xwe ya li Kurdan li pêş çavan e. Divê girseya başûrê rojava bi vê zanibe, hesabê vê bike û li ser vê bingehê di hilbijartinê de bi erk û mîsyona xwe ya dîrokî rabe.”
Elîf Ronahî da xuyakirin ku bi rêya zext û zordariyê hewl tê dayin gel bê tepisandin û êrîş û komkujiyên li Kurdistanê hatin kirin bi bîr xist. Ronahî wiha dewam kir, “Erdogan dixwaze polîtîkayên xwe yên qirkirinê yên li Kurdistanê bidomîne. Lewma hewl dide 5 salên tê garantî bike. Girîng e gelê Mereşê, civata Elewiyan hay ji vê hebe û bi vê bîr û baweriyê tevlî hilbijartinê bibe.”
Ronahî destnîşan kir ku nêrîna “çi bê kirin jî wê Erdogan bi ser bikeve” nêrîneke şaş e û got, “Qeder nîne ku Erdogan timî desthilatdar be û li dijî Kurdan polîtîkaya qirkirinê bimeşîne. Di destê gel de ye ku Erdogan bê têkbirin û faşîzm ji holê were rakirin. Lewma dengekî bi tenê jî di vê hilbijartinê de gelekî girîng e û bi bandor e. Divê gelê li başûrê rojava bi vê zanibe.”
Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Elîf Ronahî anî ziman ku erk û wezîfeyeke mezin dikeve ser milê jinên Kurd û Tirkiyeyî û got, “Pêwîste jin zanibin ku her dengekî wan guleke demokrasî û azadiyê ye û bi vî rengî biçin ser sindoqan. Eger HDP di vê hilbijartinê de ji bendê derbas bibe, wê hem li hundir hem jî li derve li dijî zayendîperestiya civakî têbikoşe. Her wiha jin wê bibe jehrkuja ji bo têkbirina faşîzma Erdogan.”
Elîf Ronahî got, ji bo di navbera gelên Mezopotamya û Anatoliyê de bingeheke siyasî, aştiyane û demokratîk bê afirandin, divê jin bi rola pirê rabin û diyar kir, girîng e her jinek bi dehan kesê/î bi rêxistin bike û biçe ser sindoqan. Pêwîste jin dengê xwe bidin HDP’ê û Demîrtaş, îradeya xwe ya rêxistinbûyî di sindoqan de jî nîşan bidin, eger HDP ji bendê derbas nebe wê zîhniyeta koledariyê li jinê ferz dike, di asta herî dijwar de bidome.Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Elîf Ronahî got, “eger faşîzma Erdogan neyê têkbirn wê ne tenê gelê Kurd, her wiha li dijî hemû gelên Tirkiyê êrîş zêde bibin û got, “Ji bo rewşeke bi vî rengî rû nede, girîng e her kes bi berpirsyariyeke dîrokî biçe ser sindoqan û dengê xwe bide…*ANF*

## Festîvala Fîdan Dogan hat lidarxistin

Festîvala Jinên Kurd a Fîdan Dogan-Rojbîn ku ji bo bîranîna Fîdan Dogan hate lidarxistin, li parka Creteil Pompadour Val De Marne ya li paytexta Fransa Parîsê pêk hat.
Jinên Kurdistanî û Fransayî yên tevlî festîvalê bûn, careke din daxwaza xwe ya ji bo ‘edalet û ronahiyê’ anîn ziman.
Li qada festîvalê ku ji aliyê Tevgera Jinên Kurd a li Fransayê (TJK-F) ve hate organîzekirin, danê sibehê stand hatin danîn. Tevî standên danasînê yên Partiya Komunîst a Fransayê, TJK-F, Rêxistina Jinan a Cîhanê, SKB û FEDA’yê, pêşangeheke wêneyan a ji wêneyên Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Şaylemez û jinên siyasî yên sê salên dawî li gelemperiya cîhanê hatin kuştin, hate vekirin.
Festîvalê saet 14’an dest pê kir û gelek parlamenterên Fransayê û rayedarên şaredariya herêmê tevlî bûn.
Di festîvalê de bi navê TJK-F Şengul Karaca peyivî, silav da beşdaran û diyar kir ku ew serbilind in ji ber ku bi navê Rojbîn-Fîdan Dogan festîvaleke bi vî rengî tê lidarxistin. Karaca da xuyakirin ku ew şopdarên nirx û têkoşîna Rojbîn-Fîdan Dogan, Sakîne Cansiz û Leyla Şaylemez in û diyar kir ku heta ku komkujî ronî bibe wê li pey vê dozê bin.
Senatora Val De Marne ya ji Partiya Komunîst a Fransayê Laurence Cohen û Seroka Komeleya France-Kurdistan Sylvie Jan jî li qada festîvalê axivîn û destnîşan kirin ku nedarizandina hêzên li pişt komkujiya Parîsê ne, şerma Fransayê ye. Qisekeran diyar kir, di têkoşîna ronîkirina komkujiyê de ew bi jinên Kurd re ne.
Dostên Kurdan, di têkoşîna dijî rejîma despot a Erdogan de bal kişandin ser girîngiya pêvajoya hilbijartinê û destnîşan kirin ku di 24’ê Hezîranê de ew gelê Kurd û hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyî re beşek ji pêvajoya hilbijartinê ne.
Koordînasyona KJK’ê jî mesajek şand festîvalê û beşdar silav kir. Di peyamê de hate gotin, “Jinên ku hêza pêşeng a şoreşê ne, girîng e rastiya sîstema li Ewropayê baş têbigihêjin û li ser bingeha dilsoziya bi bîranîna Şehîd Sara, Rojbîn û Ronahî hê bi xurtî bi mîsyona xwe ya pêşnegiyê rabin.”



Nûnerên FEDA, SKB û Rêxistina Jinan a Cîhanê jî li festîvalê axivîn û işaret bi girîngiya têkoşîna jinan kirin. Nûnerên saziyan di têkoşîna jinê de bal kişandin ser cihê jinên Kurd û gotin, li dijî nîjadperestî, faşîzm, qirkirina jinê û sîstema baviksalariyê jin wê têkoşîna xwe ya hevpar bidomînin.”
Koma jinê ya TEV-ÇAND’ê Kevana Zêrîn, Yelda Abbasî, Ozlem Baglayan, Nûarîn, koma Roj Arya ya govendê, koma muzîkê ya Cezayîrî Tighri Uza di festîvalê de derketin ser dikê û hunera xwe pêşkêş kirin. Festîval bi qîrîna dirûşma “Jin jiyan azadî” qediya.

## Em ji bo azadiya jinan şer dikin



Şervanên YPJ‘ê yên di Pêngava Bagera Cizîrê de cih girtine, diyar kirin ku wan azadiya xwe di nava YPJ‘ê de dîtin û destnîşan kirin ku ew ê ji bo azadiya hemû jinan, têbikoşin.
Şervanên YPJ‘ê di Pêngava Bagera Cizîrê de ya bi armanca rizgarkirina bajaroka Dişîşa û ewlekariya sînorê Iraq û Sûriyê di eniyên pêş de li hemberî DAIŞ’ê cih girtine. Hejmareke şervanên YPJ‘ê yên ku nû tevlî refên YPJ‘ê bûne armanca tevlîbûna xwe ya Pêngava Bagera Cizîrê de anîn ziman û gotin ku ew ji bo azadkirina jinan ji çeteyên DAIŞ‘ê şer bikin.
Zeyneb Dêrik: Ev cara yekemîne ez tevlî şerê li dijî çeteyên DAIŞ‘ê dibim. Wekî jineke ciwan ji Dêrazorê ez ê wezîfeya xwe ya rizgarkirina welatê xwe û jinên Ereb ji zilma DAIŞ‘ê ya bi salan pêk bînim, ez ê li hemberî zihniyeta ku jin tenê karê malê dike û zincîrên kolekirina jinan bisekinim.”
Viyan Dêrazor: Ez beşdarî Pêngava Bagera Cizîrê ya rizgarkirina bajaroka Dişîşa bûme û ez ê beşdarî pêngavên li pey wê jî bibim, wekî ku ez azad bûme, ez ê jinên bindest jî rizgar bikim, da ku mafên xwe bidest bixin.”…*ANHA*


## Kongreya Star akademiyeke nû vekir



Rêxistina Kongreya Star akademiyek ji bo perwerdeya jinên ciwan, xebatkar û hemû jinên ku cihê xwe di saziyan de digirin, vekir.
Kongreya Star li Kobanê akademiyek li ser navê şehîd Şîlan Kobanê vekir. Di akademiyê de wê li ser gelek mijaran perwerde bên dayîn û hemû jinên ku cihê xwe di saziyan de digirin wê beşdarî perwerdeyê bibin.
Di akademiyê de wê her dewreyek 45 rojan dewam bike, dewreya yekemîn wê 25’ê meha Hezîranê dest pê bike û herî kêm wê 30 kes tev li perwerdeyê bibin.
Navend perwerdê ji aliyê dayika şehîd Şîlan Kobanê ve hat vekirin.
Di merasîma vekirinê de li ser navê Kongreya Star Karla Cinlonî ku bi eslê xwe îtalyan e, axivî û wiha got: “Di vê astê de me dît ku her kes piştgiriya gelê kurd dike û niha zexteke pir cuda li ser jinan heye û em li hemberî vê yekê bi hevkariya xwe xebatan dikin, ji bo ku em bikarin li ser her tiştî bisekinin, wek saziyên jinan.”
Her wiha axaftin ji aliyê nûnerên saziyan yên jin û rêveberiyên jin ve hatin kirin û di axaftinan de hat gotin ku divê her jinek cihê xwe di saziyan de bigire, tev li perwerdeyan bibe û xwe bi pêş bixe…*ANHA*

## Divê jin ji bo azadiya xwe têbikoşin

Dîlan Cûdî diyar kir roj nîne ku jin xwe li Îranê neçarê xwekuştinê nayê kirin û nayê kuştin. Dîlan Cûdî ku diyar kir sîstema Îranê berê jinan dide mirinê wiha got, “Rejîma Îranê berê jinan dide mirinê. Lê, divê jinên Kurd û Îranê xwe bikin yek û ji bo mafê xwe têbikoşin.”
Endama Koordînasyona Komelgeha Jinên Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) Dîlan Cûdî qeyrana civakî û pirsgirêkên ku jin li Kurdistan û Îranê rû bi rûyê wê tên û rêyên wê yên çareseriyê nirxand. Dîlan got ku ger guhertinek li Îranê gengazbe ew jî ancax dikare civaka Îranê û jin çêbikin û wiha axivî, “Dewleta Îranê ji guhertinê gelek ditirse. Lê, civaka Îranê û jin daxwaza guhertinê dikin û ji bo vê jî di nava lêgerînê de ne.”Cûdî got, “Sedema sereke ya kuştin û xwekuştina jinan siyaseta cinsiyetperest a dewletê ye. Dewlet berê jinan dide mirinê. Divê jin xwe nekujin. Pêwîste jinên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê dest bi hev û ji bo bidestxistina mafê xwe têbikoşin…*ROJNEWS*



## Bila herin Kurdistana xwe

Qasim ENGÎN

Dewleta tirk bîryar girtiye ku Başûrê welatê me dagir bike. Ji bona wê jî her roj bi şêwekê din erîşên bi hovana dibe ser axa welatê me. Dewleta tirk bi rejîma xwe ya faşizan û ferasata dagirker, dixwaze qaşo axên ku dema xwe de Osmanî bi darê zorê zept kirîbûn carek din zept bike, ango bixe dest xwe. Ji bona wê jî gelek caran qala axa Osmaniyan a 22 mîlyon kîlometre çargoşe dikin. Caran qala axa Mîsakî Mîlî ya derdora 3 mîlyon kilometre çargoşe dikin. Dema qala axa 3 mîlyon kilometre çargoşa dikin, bêguman qala dagirkirina Heleb, Mûsil, Kerkûk û Silêmanî dikin. Lê heman demê qala Batuma Gurcistanê û Selanîka Yunanistanê jî dikin.
Bi kurtahî, dewleta tirk a bi hişmendiya xwe ya faşîzma kesk-spîreş çavên xwe carek din berdaye hemû Kurdistanê. Li gorî dewleta dagirker, hebûna wan di tunekirina Kurdan de derbas dibe. Ji bona wê pêwîste ku hemû destkeftiyên Kurdan-li ku derê dibe bila bibinwerin tepisandin û ji dest Kurdan werin girtin. Destur ew e! Em hîç dûr neçin û 16'ê cotmeha 2017 bimeyzînin. Çawa di rojekê de ewqasî destkeftiyên Kurdan ji dest Kurdan girtin. Yên ku ji vê kerasetê rê vekirin bê teredut dewleta tirk ango rejîma MHP-AKP bûn. Dîsa erîşên hovane li ser Efrîn hê bi berçavin. Him erîşên hovane birin ser Efrînê him jî çeteyên wek DAÎŞ, El Nusra û yên din anîn Efrînê û Kurdên ku li wê derê dijîn derdixin. Her kes dibîne ku hê jî dixwazin çeteyan li Efrîn bi cih bikin. Em hîç qala erîşên ewqasî faşizan li ser axa Bakûrê Welatê me û gelê me yê ku li wê derê dijî, nekin. Niha jî dewleta tirk a dagirker û faşîzan erîşên xwe vekirî tîne ser Başûrê Welatê me. Dixwazi Başûrê welatê me dagirker bikin. Li gorî Plansaziya Mîsakî Mîlî hewldidin heta Kerkûk û Silêmanî jî biçin. Niha, tam di rewşek wiha de bi xemgîniyek gelek mezin em dişopînin ku hinek Kurd-çiqasî û çendî Kurdan em hewaleyê dîrokê û hewalê wijdanê gelê me dikin-heman wek hişmendiya dewleta tirk a faşizan difikrin û heman wek wan jî diaxivin û dibêjin: "Me Kurdistana xwe rizgar kiriye bila gerîla herin Kurdistana xwe û li Kurdistana xwe şer bikin." Erê yên ku wiha bi zimanê dewletên dagirker diaxivin û wiha difikrin çendî û çiqasî Kurdan bila dîrok bîryar bide. Lê em dizanin yên ku dibêjin Kurdistan tuneye, dewletên dagirkerin. Yên ku Kurdistan perçe kirine, ew in. Û her wiha yên ku hişmendiya perçegerî pêşxistine jî, ew in. Ma pir dûre ku em bêjin yên ku wek dewletên dagirker difikirin û diaxivin heman tirşikçiyên wan in. Lê rastiyake din jî heye, gerîla ne hêza perçegeriye. Gerîla xwe wek parêzvanê hemû Kurdistanê dibîne, gerîla ji bo hemû Kurdistanê jî derketine çiyan. Û ji bo vê rastiyê jî, heta niha bi hezaran gerîla canê xwe ji bo axa nîştîman jî feda kirin e. Lê rastiyek din jî heye, eger îro gerîla –xweda neke- li axa başûrê welatê me derkeve, ne dûre ku di çend rojan de dewleta dagirker a tirk bi tevahî hêza xwe ya faşîzan, bi tankên xwe derbasî nava Kerkûk û Silêmanî bibe. Ji bo wê jî pêşniyara me ew e ku, yên ku wek dewletên dagirker difikrin û diaxivin êdî an bila neaxivin an jî bila kerema xwe biçin cem dagirkeran biaxivin û li cem wan bi wan re bijîn!

# Rûmate gel hêjayî her tiştî ye

***Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû destnîşan kir ku divê hêzên demokrasiyê û gelê Kurd li pêşberî êrîşan paş ve gavê neavêjin û got: "Girîng e hîn bi rêxistinî û zanebûn li dijî êrîşan li ber xwe bidin. Hay ji komplo û provokasyonan hebin, lê belê serî li ber zext û zilmê netewînin û îradeyeke hê bi biryar nîşan bidin.***

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû bal kişand ser êrîşên dema dawî yên rejîma AKP-MHP'ê û got, "Divê gelê Kurd û hêzên demokrasiyê li dijî êrîşan hê bi rêxistinî û zanebûn li ber xwe bidin."
Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû di gotara xwe ya rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê de êrîşa rejîma AKP-MHP'ê ya li Pirsûsê û helwesta gelê Kurd û hêzên demokrasiyê ya li dijî vê êrîşkariyê nirxand.
Karasû diyar kir ku faşîzma AKP-MHP'ê bi gotina "Pirsgirêka Kurd nîne" hebûna Kurdan înkar kiriye û got, "HDP'ê weke rêxistineke terorîst nîşan dide. Ji bo Selaheddîn Demîrtaş jî qala îdamê dike. Ev yek karakterê Erdogan û desthilatdariya AKP'ê yê dijminatiya li Kurdan nîşan dide."

### GLADYOYA QESRA ERDOGAN LI RIHAYÊ LI SER KAR E

Karasû da xuyakirin ku faşîzma AKP-MHP'ê bi vê nêzîkatiyê êrîşên xwe yên li ser HDP'ê zêde kiriye û got, "Êrîşên dema dawî yên li dijî HDP'ê ku zêde bûne, ji aliyê



gladyoya qesrê ya Tayyîp Erdogan ve tên plankirin û birêvebirin. Komplo û provokasyona li Riha/ Pirsûsê ji aliyê Tayyîp Erdogan û gladiyoya wî ve hatiye plankirin û bi cih hatiye anîn. Bi vî rengî dixwazin pêşî li tinebûna AKP'ê li Kurdistanê bigire. Wê vê bûyerê bikin hincet û zext û êrîşên li ser HDP'ê zêdetir bikin. Rê û rêbaza weşandina bûyera li Pirsûsê ji aliyê medyayê ve, bingehê ji van êrîşan re amade dike. Li Rihayê gladyoya qesrê heye. Axaftina Şaredarê Serêkaniyê, provokasyona li Pirsûsê, komplo û komkujî ji hev cuda nînin. Girîng e gelê Rihayê bi vê rastiyê zanibe û li her cihî xwe hîn bêhtir bi rêxistin bike, bi biryar be û hê bêhtir li ber xwe bide."

### RÛMET Û AZADIYA GELEKÎ JI HER TIŞTÎ HÊJATIR E

Karasû destnîşan kir ku divê hêzên demokrasiyê û gelê Kurd li pêşberî van êrîşan paş ve gavê neavêjin û wiha dewam kir: "Girîng e hîn bi rêxistinî û zanebûn li dijî van êrîşan li ber xwe bidin. Hay ji komplo û provokasyonan hebin, lê belê serî li ber zext û zilmê netewînin û îradeyeke hê bi biryar nîşan bidin. Ji rûmet û îradeya azad a gelekî hêjatir tiştek nîne. Ji bo vê her berdêl tê dayin. Teslîmiyet û jiyana bêrûmet, jiyaneke pûç e; ji mirina hezar carî xerabtir e. Bi deh hezaran ewladên gelê Kurd li şûna jiyaneke bê rûmet, berxwedaneke bi rûmet hilbijartine. Bi hezaran şehîdên bi vî rengî yên hêzên demokrasî û şoreşgerî yên Tirkiyeyî jî hene. Şehîdên me nîşan didin ku divê em bi çi rengî bijîn û bi felsefeyeke çawa têbikoşin. Gerîla li dijî êrîşên dewleta Tirk bi rengekî fedayî û dîrokî li ber xwe didin. Ev berxwedan rêya paşeroja azad radixe pêş çavan. Berxwedan wê paşeroja azad biafirîne. Gelekî ku ewladên xwe yên bi vî rengî hene, nikare teslîm bê girtin. Ne tenê bi deh hezaran ewladên gelê Kurd ên gerîla şehîd bûne, bi deh hezaran jin, ciwan, extiyar, zarok di berxwedana dijî faşîzma qirker de şehîd bûne. Ji ber vê yekê gelê Kurd û hêzên demokrasiyê wê li dijî êrîşan li ber xwe bidin. Ji xwe gelê Kurd û hêzên demokrasiyê bi gotin û helwesta xwe ya li her cihî ev yek nîşan dane."
Di dawiya gotara xwe de Karasû bang li gelê Kurd û hêzên mûxalîf kir ku vê firsenda hilbijartinê baş bi kar bînin, xwedî li deng û sindoqan derkevin û desthilatdariya AKP'ê têk bibin.

# 24'ê Hezîranê em ê govendê bigerînin



Rêxistina HDP'ê ya Stenbolê di çarçoveya xebatên hilbijartina 24'ê Hezîranê de li Qada Bazara Gel a Bakirkoyê mîtîng pêk anî. Bi sed hezaran kes beşdarî mîtîngê bûn. HDP'ê di çarçoveya xebatên hilbijartinê yên 24'ê Hezîranê de li Stenbolê mîtîngeke girseyî pêk anî. Di mîtîngê de bi sed hezaran kesên amade bûn peyama serkeftina 24'ê Hezîranê dan.

### STENBOLÊ TERCÎHA XWE KIR

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan di mîtîngê de axivî û wiha got: "16 sal in bi xwe dibêjin 'Me ev welat baş bi rê ve nebir'. Lê di 3 salên dawî de bi KHK'ê hemû kes mexdûr birin. Bi sedan akademîsyen, mirovên aştiyê, akademîsyen, mirovên aştiyê avêtin zindanê. Li vî welatî siyasetmedar, wekîl, şaredar ji kar girtin û avêtin zindanê. Li şûna wan qeyûm tayîn kir. Bi taybetî qeyûmên tayîn bûn tenê heqaret li gel kirin. Em soz didin we, di serî de em ê Qeyûman û piştre Tayyip Erdogan di sindoqan de defin bikin. Xwezî li şûna pira sêyemîn û balafirgeha sêyemîn pira di navbera dilan de ava kiribûna. Mirov nekiribûna dijminên hev. Ermen, Kurd û Tirk kiribûna dostên hev. Hêvî, aştî, demokasî û çiqas nirxên mirovahiyê tev bin pê kirin. Ez li vir îlan dikim we îktidarê hilbijartin winda kiriye. Ka li 5 salên pêş me binerin. Binerin HDP û Birêz Demirtaş vî welatî çawa bi rê ve dibe."

### EM Ê BI CIWANÎ BI SER BIKEVIN

Her roj bi xofa Demîrtaş dijîn. Ji bo vê yekê serî li hemû lîstikan didin. Ji ber vê yekê duh li Pirsûsê komkujî kirin. Serî li hemû derewan didin. Rast e li şûna bersivan bigirin, mexdûran destgîr dikin. Em li vir bang li dozger û dadgerên bi wijdan dikin. Em vê dozê bernadin. Em dibêjin hûn jî li gorî edaletê tev bigerin. Em dizanin ev lîstik in. Em naxwazin ev bûyera Pirsûsê jî ser wê bê girtin. Divê ser wê bê ronîkirin. Ew wisa difikirin ku bi van bûyerên wekî Pirsûsê wê kes neyê cem me. Lê em îro li vir dibînin gelê Stenbolê li cem me ye. Ez li vir bang li Elewî, Suryan, Çerkez, Ermen û hemû beşên civakê



dikim em bi xwe pêşeroja xwe diyar bikin. Me bi ciwanî dest pê kir, em bi ciwanî berdewam bikin. Jinên rêzdar ku bedelên mezin û êşên mezin kişandin. Tifaqa me ava kir tifaqa jinan gurmegurme tê. Bila hebûna me diyarî pêşeroja aştî û aramiya vî welatî ye. Bijî biratiya gelan. Bijî welatê hevpar û jiyana hevpar. Em ê welatê ku Ceylan Onkol, Ûgûr Kaymaz, Alî Îsmaîl Korkmaz û kesên din ên jiyana xwe ji dest dane bikin welatê ku êdî kes lê neyê kuştin. Em li sindoqan xwedî derkevin. Em ji we bawer in û em bi we bawer in. Em destûr nedin dengekî me bê dizîn. Em bi hev re pêşeroja xwe, azadiya xwe ava bikin. Di 24'ê Hezîranê de em ê bi hev re govendê bigerinîn."

# 24'ê Hezîranê wê bibe roja xelasiyê

Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş ji girtîgeha Edîrmeyê ku lê dîl girtî ye, mesajeke nû şand.
Mesaja Demîrtaş ku li ser hesabê wî yê Twitterê hate weşandin wiha ye: "24'ê Hezîranê wê bibe roja xelasiya ji tirs û xofan. Em ê bi hev re bijîn. Bêyî ji hev cihê bibin, bêyî li ber hev rabin, bi lihevkirinê û di nava demokrasiyê de em ê xurt bibin. Em ê rojhilat û rojavayê welatê xwe di nava heman dilî de bikin yek. Em ê bi guhertineke mezin a demokratîk xwe ji bo sala 100. a komarê amade bikin.
Li şûna nefret, hêrs û dijminatiyê, em ê hezkirin, aramî û rêzdariyê geş bikin.



Li şûna rant, bertîl û gendeliyê, em ê xwêdana ji eniyê diherike, nan û kedê pîroz bikin. Em ê xwe li êş û azaran rabigirin û Tirkiyeya paşerojê bi hev re ava bikin. Ji ber ku em bi hev re bedew in. Bêyî te nabe, ancax bi te dibe.
Sîstema yek şexsî rê li ber parçebûneke mezin vekir. Bi demokrasiyeke xurt em dikarin xwe li hev bigirin, ne bi sîstema yek şexsî. Ez ne dest ji Manîsayê diqerim, ne jî ji mêrdînê. Ne ji Edîrneyê ne ji Colemêrgê. Hûn jî dest jê bernede xwişk û birayê min ên hêja. Em dest bidin hev, ji ber ku guhertin bi te dibe.
Her kesî berê kêmasî kir. Ji xizmên me yên li Çanakkaleyê li gel hev radizên heta pêşiyên me, em dersê ji wan bigirin. Bi dilekî wêrek em şaşitî û kêmasiyên xwe deynin holê. Nirxên me yên hevpar ên li Çanakkaleyê çiqasî wehkev in, çiqasî bi rûmet in, em jî bi wî rengî bin. Em bibin welatekî bi vî rengî yê demokrasiyê."



# Em ê li başûr rê nedin artêşa Tirk

***Endamê Konseya Fermandariyê yê HPG'ê Amed Malazgîrt diyar kir ku Artêşa Tirk amadekariya operasyonekê dike û got, "Em jî amadekariyên xwe dikin. Dewleta Tirk dixwaze şer li Başûrê Kurdistanê bidomîne. Berdêla wê çi dibe bila bibe, em ê nehêlin artêşa Tirk li Başûrê Kurdistanê bi pêş ve biçe."***



Amed Malazgîrt diyar kir ku ew ê destûrê nedin ku dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê bi pêş ve biçe.
Endamê Konseya Fermandariyê yê HPG'ê Amed Malazgîrt roja Yekşemê tevlî bernameyeke Stêrk Tv bû û êrîşên dagirker ên dewleta Tirk nirxand. Malazgîrt têkildarî dagirkeriya li ser Başûr û operasyona li ser Qendîlê daxuyaniyên girîng da.
Malazgîrt diyar kir ku di navbera gefên operasyona li ser Qendîlê û hesabên hilbijartinê yên Erdogan de têkilî heye û got, "Hikumeta AKP'ê dixwaze PKK'ê bike rojev û ji faşîstan dengan bistîne, ji ber vê jî Kurdan tune hesap dike. Ev hemû tişt jî taktîk û lîstikên Erdogan û hikumeta AKP'ê ye."

### ÇEKÊN MODERN LI SER ME DICERIBÎNIN

Malazgîrt diyar kir ku êrîşên hewayî bi awayekî zêde didome û got, "Hemû çekên nû û yên modern li ser hevalên me diceribînin. Ev rast e. Lê wekî ku AKP dibêje, rewş ne wisa ye. Erdogan di wan rojan de digot bi 24 balafiran êrîşî Qendîlê kirine û derbeyeke giran li PKK'ê xistine. Di van êrîşan de tiştek bi hêzên me nehatine. Ev êrîş li dijî gundên sivîlan pêk hatiye. Mebesta van êrîşan ev e ku sivîlên li herêma Qendîlê bidin koçkirin."
Malazgîrt diyar kir ku tecrubaya wan a gerîlatiyê ya 35 salan heye û ew dizanin ew ê xwe çawa biparêzin. Malazgîrt got, "Erdogan ji sala 2002'an û vir ve li ser desthilatdariyê ye. Em jî 35 sal in li dijî dewleta Tirk şer dikin. Tecrubeya me ya şer têra xwe heye. Dewleta Tirk di salên 90'î de li dijî me şerekî berfirehtir dida meşandin. Îro ji wan salan cihêtir leşkerên bi pereyan bi kar tînin lê ligel vî tiştî jî ne serkeftî ne."
Malazgîrt têkildarî rewşa artêşa Tirk a li Başûrê Kurdistanê jî agahiyên girîng da. Malazgîrt got, "Artêşa Tirk sala borî li qada Barzanê Girê Botî dagir kir. Berê ev der xeta me ya derbasbûnê bû. Niha ew jî li wir in, em jî li wir in. Her roj hevalên me li dijî wî girî çalakiyan li dar dixin. Di meha Adarê de li herêma Geliyê Reş artêşa Tirk operasyonek da destpêkirin. Li wê herêmê hin şehadet pêk hat. Fermandarê Eyaleta Xakurkê heval Agirî û komek hevalên bi wî re şehîd ketin. Artêşa Tirk li wan giran bi cih bû û ber bi Girê Lêlkanê ve hatin. Rast e li van giran bi cih bûne. Lê ji roja ku hatine hevalên me li dijî wan çalakiyan li dar dixin û derbên giran li artêşa Tirk hate xistin. Artêşa Tirk ne ewqasî serkeftî ye. Dibêjin em nêzî Qendîlê bûne lê a niha herî zêde li Girê Lêlkanê ne. Hewl didin bi pêş ve herin. Li gorî agahiyên ku me stendine hêzên xwe û qawetên xwe şandine ser Şemzînan û Colemêrgê. Hin wesayîtên zirxî û çekên teknolojîk anîne vê derê. Artêşa Tirk amadekariya operasyonekê dike. Em jî amadekariyên xwe dikin. Dewleta Tirk dixwaze şer li Başûrê Kurdistanê bidomîne. Em ê destûrê nedin vê dagirkeriya Tirkan. Ew ê çalakiyên me yên li dijî wan bidome. Berdêla wê çi dibe bila bibe, em ê nehêlin artêşa Tirk li Başûrê Kurdistanê bi pêş ve biçe."

### HELWESTA HEWLÊR Û BEXDAYÊ YA LI DIJÎ DAGIRKERIYÊ

Malazgîrt têkildarî helwesta Herêma Kurdistanê ya Federe û ya hikumeta Iraqê jî got, "Bi qasî ku em dibînin bêdengiyek heye. Divê ev dagirkerî neyê qebûlkirin. Mesele ne PKK ye. Tirkiye ji bo meşrûkirina dagirkeriyê li her derê hincetekê derdixe. Gelê Başûrê Kurdistanê li dijî dagirkeriyê berxwedanên mezin pêk aniye. Başûrê Kurdistanê xwediyê giyanekî berxwedanê yê mezin e. Gel, ciwan û pêşmergeyên Başûrê Kurdistanê ew ê vê dagirkeriya Tirkiyê qebûl nekin."
Malazgîrt wiha dewam kir, "Dewleta Tirk destkeftiyên Kurdan jî ji xwe re dike hedef. Nexwe dewleta Iraqê jî dikare bibêje DAÎŞ ji ser Tirkiyê tê û leşkerên xwe li Tirkiyê bi cih bike. Heke Tirkiye vê rewşê qebûl dike, bila Iraq û Îran jî qebûl bike. Îran jî dikare bibêje di nav Tirkiyê de dibe ku êrîşî min were kirin, ez ê jî li Tirkiyê baregehan ava bikim. Gelo Tirkiye dikare vî tiştî qebûl bike? Ew ê neke."
Malazgîrt herî dawîn hilbijartinên 24'ê Hezîranê nirxand û got, "Divê li Bakurê Kurdistanê tu kes dengê xwe nedin AKP'ê. Peywira hemû Kurdan e ku AKP ji Bakurê Kurdistanê derxînin."

# Divê Iraq li hember dagirkeriyê helwest nîşan bide

Erdelan Şêx Fatih diyar kir ku dewleta Tirk qanûnên navnetewî, qanûnên cîrantiyê binpê dike û ji hikûmeta Iraqê xwest ku bang li NY bike da ku Konseya Ewlekariya Navnetewî li dijî dagirkeriya Tirk kom bibe û biryar bide.
Hiqûqnas û parêzer Erdelan Şêx Fatîh li ser binpêkirin û êrîşên dewleta Tirk li ser axa Iraqê axivî û got, "3 yasayên ji bo parastina serweriya xaka dewletek heye. Yasaya navdewletî, navxweyî û herêmî. Dagirkeriya dewleta Tirk berevajiyê van her sê qanûnane û serweriya xaka Iraqê binbê dike. Ger bê xwestin Neteweyên Yekbûyî dikare rol bilîze. Divê Hikûmeta Iraq ji bo rawestandina dagirkeriya Tirk daxwazê ji NY bike ku Konseya Ewlekariya Navnetewî kom bibe.
Erdelan di dewama axaftina xwe de îşaret bi qanûnên cîrantiyê jî kir û diyar kir li gorî xala 7 û 8'an a destûra Iraqê dewletên cîran rêz li serweriya hev bigirin û dazanîn ku derbaskirina sînor ya leşkerên Tirk li dijî van xalane. Erdelan destnîşan kir ku hemû rayedarên dewletê li ser parastina xaka Iraqê sond dixwin û got: "Serokkomar, parlamento û Desteya Wezîran sond dixwin ku xaka Iraqê li hember her dijminahiyekî biparêzin. Li gorî vê sondxwarinê pêwîste li hember her êrîşeke li ser serweriya xaka Iraqê bikevin tevgerê."
Di dawiyê de parêzer Erdelan Şêx Fatih rexne li Serokkomarê Iraqê û cîgirê serokê parlementoya Iraqê



ku Kurdin kir û diyar kir ku ew di vê mijarê de erka xwe pêk naynin û axaftina xwe wiha bi dawî kir, "Tirkiye hêzek zêde aniye devera Hewlêr û Behdînanê. Li gorî xala 37 a sala 2003'ê ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê, divê ev hêz werin derxistin. Divê kesên ku rê li ber hatina van hêzane vekirine werin dadgeh kirin. Lê, ev biryar ne hate pêk anîn…***ROJNEWS***


# Eniya Netewî li Qendîlê peyam da



Bi sedan kesên ku bi pêşengiya Bereya Niştimanî ya Dijî Dagirkeriyê û KNK'ê çûn Binarê Qendîl, êrîşên dagirkeriyê yên Tirkiyê şermezar kirin û peyamên têkoşînê dan.
Bi armanca şermezarkirina êrîşên dagirkeriyê yên Tirkiyê ku li ser Başûrê Kurdistanê dimeşîne, ji Xaneqîn heya Dihokê bi pêşengiya KNK'ê û Bereya Nîştîmanî ya Dijî Dagirkeriyê bi sedan kesan berê xwe dan Qendîlê.
Ji bajarên Silêmanî, Helepçe, Kerkuk, Hewlêr, Duhok, herêmên Raperîn, Germiyan bi sedan kesên ku di nava wan rêveber û endamên partiyên siyasî, rêxistin û saziyên civakî, her wiha bawermend jî hene, serê sibehê ketin ser riya Qendîlê. Karwanê çalakvanan di saetên nîvro de gihîşt Binarê Qendîl û çû serdana çadira Mertalên Zindî ku ji 8'ê Hezîranê ve hatiye vedan.
Girseya gel li vir piştî ku ji aliyê Mertalên Zindî ve hat pêşwazîkirin, daxuyaniyek da çapemeniyê. Daxuyaniya ku hat dayîn de êrîşên dewleta Tirk hatin şermezar kirin. Nûnerên saziyan bang li gelê Kurdistanê û hemû hêzên siyasî yên Kurdistanê kirin ku li dijî dagirkeriyê helwestê nîşan bidin.

# Edî dem hatiye ku gel çarenûsa xwe diyar bike

Hevseroka Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Rîham Hico li ser pêşketinên dawîn ên leşkerî û siyasî, bandora wan a li ser kurdên Êzidî, û sekin û helwesta kurdên Êzidî nirxand.
Rîham Hico di destpêka nirxandinên xwe de bal kişand ser tecîrda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û wiha got: "Dewlata tirk ya dagirker bi girankirina tecrîda ya li ser Rêberê me wê encam negere û nikare me û Rêberê me ji hev biqetîne. Rêber Apo ji bo hemû civakên bindest ronahî ye û rêberê gelê bindest e. Ji bo me jî Rêber Apo hebûn e."
Rîham derbarê planên dewleta tirk yên li ser Îmraliyê de jî wiha got "Armanca dewleta tirk ya ji tecrîdê ew e ku me ji fikir û felsefeya Rêberê me dûr bike. Çawa ku dewleta tirk bi pêkanîna komploya 1999'de bi ser neket wê vê carê jî bi ser nekeve."
Rîham Hico li ser wateya azadiya Ocalan û girîngiya wê ya ji bo civaka Êzîdî wiha got "Em jî weke civaka Êzidî ku me bi fikir û ramanên Rêbertî xwe perwerde û nas kiriye em weke gelê Êzidî tecrîda li ser Rêber Apo tecrîde li ser xwe dibînin. Em baş dizanin ku dema fermana 3'yê Tebaxa 2014'an ku bi hevkariya dewleta tirk, Erdoxan û bi destê DAÎŞ'ê hat kirin şervanên PKK'ê ew vala derxistin û ji bo me şer kirin. Ji ber vê fêdekariya PKK'ê ku bi felsefeya rêber Apo hat kirin em jî vê felsefeyê wekî felsefeya jiyana xwe dibînin."
Rîham Hico êrîşên dewleta tirk yê li ser başurê Kurdîstan û gefên wê yên li ser Şengalê nirxand û got:



"Her dem dewleta tirk di dirokê de êrîş li ser deskeftiyên gelan û bi taybetî jî gelê kurd pêk anîye û xwestiye wan ji çanda wan ola wan dûr bixe û têxe bin destê xwe. Çewa bi hebûna DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê û Efrînê kirin niha jî êrîşî xaka başûrê Kurdîstanê dike. Li ber çavê her kesî êrîşî xweza, cîh û warên sivîlan tê kirin. Armanç dagirkirin e, axa xwe zêde kirine. Ev êrîşên dewleta tirk nîşaneya ber bi têk çuyin û hilweşandina dewleta tirk e."…***JINNEWS***

# Li Îranê 24 hezar jinebiyên biniya 18 salî hene



Li Îranê parlementereke jin diyar kir ku li welat 24 hezar jinebiyên temenê wan biniya 18 salî hene.
Li gorî nûçeyeke ajansa Roknayê parlementera bi navê Masûmeh Aga-Alîşahî bal kişand ser kêşeyên 'zewacên zû'.
Alîşahî qala zewicandina zarokan kir û diyar kir ku 24 hezar jinebî hene ku, temenê wan di biniya 18 salî ne. Li gorî texmînan hejmara rastîn zêdetir e, ji ber ku li ser vê meseleyê lêkolîneke cîddî tune.
Parlementerê pirsî ku, ev zarok ew ê dahatûya wan çawa be û hişyarî kir ku ev meyl her diçe zêdetir dibe.
Alîşahî got ku, "Keçên li bejahiyê, ji ber tunebûna dibistana navîn, ji neçarî dev ji dibistanê berdidin. Piştî dibistana seretayî jî malbat, wan dizewicîne. Bandora hejariyê jî li ser zewaca zarokan heye. Ji bo bidestxistina pereyan jî zarokên xwe di 9-10 salî de bi mêrên kal re didin zewicandin."